UNHCR
The UN Refugee Agency

Funded by
European Union
Humanitarian Aid

# Bernameya alîkariya pere-dirav li Yûnanîstanê

## AGAHÎ

## 1/ 1/Bernameya alîkariya pere-dirav çiye?

Personelên UNHCR û Saziyên Sivîl û dîsa di dema pêkanîna bernameya alîkariyê da hemî karkerên ku vî karî li wî ciyî bi kar tînin û li wir dimînin, ewlehî û parastina wan pêşitiya her tiştî ye. Di dema pêkanîna bernameya alîkariyê da, lihevketin, pirsgirêk û dijberî gava ku çêbibe, wê bernameya alîkariyê bidin sekinandin û wê bername bi paşve bike heta demike din. Hevkarî û sebra we wê bi qîmet bê zanîn.

Alîkariya pere-dirav parçeyek ji alîkariya mirovahiye ku, ji aliyê sazî û rêxistinên cûda de li Yûnanîstanê pêktînin. Ev alîkariya pere-diravji aliyê hukumeta Yûnan da nayê pêkanîn. Lê hukumeta Yûnan û Rêveberiya Giştî a ECHO vê alîkariyê qoordîne dikin. Ev alîkarî bi temamî ji aliyê Yekitiya Evrûpayê (ECHO- Rêveberiya Giştî a Evrûpayê ji bo parastin û kar û barê Alîkariya Mirovahî) pêk tê.

Ev bernameya alîkariya pere-dirav ,bi armanca ku herkes wekhev xwe bigihîne vê alîkariya hatiye birêxistin û ji bo ku pêşî li kesên ku dubare xwe tomarkirine were girtin.

Ev bernameya alîkariya mirovahîji bo ku daxwazên îlticayê,kesên bi serê xwe û malbat , kanibin hewcehiyê xwe ên rojane pêk bînin. Ev alîkarî ji bo têkiliyê, ji bo veguheztinê, ji bo hewcehiyê perwerdahiyê, ji bo dermanan, ji bo kinc û cil'an, ji bo xwarinê, ji bo hewceyiyên paqijiyê û ji bo gihîştina xizmetên dewletê. Ev alîkarî ne mûçe ye. Dem'a alîkariya pere-dirav a her mehî ji aliyê xêrxwazanda da tê diyarkirin.

Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan UNHCR, sazî û rêxistin din, ji bo bernameya alîkariya pere-dirav a ji bo piştgiriya daxwazên îlticaye , bihevre kar dikin û şertên ku kesên mafê wan heye ji bo vê bernamê li jêr hatiye eşkerekirin.

Ji bo bi cîh anîna vê bernameyê li her heremê demik jê re lazime û gav bi gav wê li her derê amade be.

Sazî wê qertên banqa yê belav bikin û wê ji bo bikaranîna qertê,bikaranîna makîna ATM û ji bo KOD'a qerta şexsî wê we agahdar bikin. Belavkirinaqertan wê bi rêxistinî pêk were û ji bo roj û saeta belavkirina qertan li her ciyî agahî were dayîn.

Kesên bi serê xwe û malbat mafê wan û qertek'ê û mehê tenê carikê pere girtin heye. Eger we xwe cîkî din we dubare xwe nivîsandibe, tenê wê perê qertek'ê da hebe, ji ber ku sazî û rêxistin wê bibînin ku we xwe dubare tomarkiriye.Ev qerta ku li ciyêke hun dimînin we girt, ev qert wê kar bike û hun kanin jê pera bikşînin .

## 2/ Ez kanim alîkariya pere-dirav bigrim ?

**Hun kanin vê alîkariya pere-dirav bigrin, eger hun :**

- Eger tu rûnuştiyî .

**Û ku YEK ji vanê xwarê bi were hene :**

- Qerta sêpel a pêşî tomarkirinê û bi temamî tomarkirina xizmetên îlticayê.
- Belge'ke rewacdar û fermî a ku hukumeta Yûnan daye we, an ji kaxiza polês.

**Hun nikanin vê alîkariya pere-dirav bigrin, eger :**

- Eger belge'ke rewacdar û fermî a ku hukumeta Yûnan daye we tuneye.
- Eger hun di bin 18'de salî re ne û bêkes in*
- Eke hun ji navenda mêvanx aneyeke din alîkariya pere-dirav ji rêxistinek mirovahî digrin.
- Eger hun li Saziyek Sivîl an jî li Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan UNHCR 'da kar dikin.
- Eger hun rojane kar dikin û mûçe digrin û perê ku hun ji kar digrin ji ê sazî û rêxistin didin we zêdetirin.

** Eger hun di bin 18'de salî re ne û bêkesin , ji kerema xwe re bi saziya ku li ciyê ku pere-dirav dide re bikevin nav têkiliyê.*

## 3/ Çi wext kanim alîkariya pere-dirav bigrim?

Bername , wê gav bi gav li hemî ciyan wê pêk were. Ew sazî û rêxistina ku li ciye ku hun dimînin alîkariyê belav dike, wê we ji bo destpêka belavkirina peran we agahdar bike.

Li ciyê ku hun dimîn dema dest bi belavkirina alîkariyê hat kirin, hun wê çaxê kanin alîkariyê bigrin.

Mafê we û alîkarî girtinê ,tenê li ciyê ku hun rûniştine heye,li cîkî din tune ye. Ev alîkariya pere-dirav di demike nêzîk da wê li hemî ciyan were belavkirin. Eger tu û malbata xwe ciyê xwe biguhezînin , hunê alîkariya pere-dirav bi derengî bistînin. Ji bo ku hun alîkariyê hildin ,hewceye hun bi xwe wek şexs li ciyê rûniştinê bin.

## 4/ Ezê çawa zanibim bernameya alîkariya pere-dirav çi wext dest pê dike?

Meh'a ewil ji bo bernameya alîkariyê a pere-dirav , li ciyê ku hun dimînin wê agahî bên dayîn.

Dema ku bernameya alîkariya pere-dirav li ciyê ku hun lê dimînin dest pê bike, wê saziya ji bo bernameyê berpirsiyare , wê we di derheqê malbata we çiqas pere-dirav mafê we heye û di derheqê qerta pere kişandindinê da wê agahdar bike. Ji bo pirsên we û ji bo agahiya zêdetir ji bo pêvajoyê wê personelli wir amade be. Ji bo ku hun alîkariyê bigrin, çi belge lazim in , ji bo komkirina wan wê agahî û wext were dayîn.

## 5/ Hêjmara alîkariya pere-dirav çawa tê hesabkirin ?

**Eger hun malbat in :**

Malbata we , an jî serekê malbata we, li gorî mezinbûna malbata we ,wê qerta ku meh'ê pere-dirav bikevinê bigre.

Tarîfa malbatê , wek ku xizmetên îlticayê, Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan UNHCR û ji aliyê Saziyên Sivîl ve hatiye qebûl kirin , jin û mêr an jî malbat bi zarokên di bin 18'de salî re ye.

**Eger hun bi serê xwe nin û bi ser 18'de salî re ne :**

Hunê qerta a meh'ê ku perê ji bo kesikî bigrin.

Zarokên di nava malbatê da ne û bi ser hîjde salî re ne û nikanin bikevin tarîfa ji bo malbatê a li jor hatiye kirin , wê bi serê xwe qert'ekê bigrin. Û dîsa kesên ku endamê malbatikê ne , wek , xwişk û bira, kal û pîr, xaltî û amoj, mam û xal, xwarzê û birazê û dotmam û pismam û maliyê din jî wê bi serê xwe qertekê bigrin.

## 6/ Ezê çiqas pere-dirav bistînim?

Hêjmara pere-dirav ê ku ji aliyê hemî sazî û rêxistinan da hatiye qebûl kirin , li hemî welat eynî ye. Hesabkirina hêjmara alîkariya ku tê dayîn li gorî mezinbûna malbatê û û eger xwarin li wir tê dayîn an na. Bi saziya ku li ciyê ku hun dimîn berbirsiyare re bikevin têkiliyê.

# 7/ Qert çawa bi kar tê?

- Qerta banqa yê mimkûne li her ciyî cûdetir bi, ji ber ku li navendan,saziyên cûde qertan belav dikin. Lê pere-diravê ku dikevin qertan li her ciyî eynî ye.
- Qerta ku hun digrin , her heyv wê eynî hêjmara peran bikeviyê.
- Ev hêjmara peran mimkûne bên guhertin. Dema ku hê-jmara peran were guhertin , emê we agahdar bikin.
- Bi vê qertê hun kanin li seranserê Yûnanîstanê peran ji ATM bikşînin. Dîsa bi vê qertê hun kanin herin li dukkanên ku makînê (POS) hene , hun kanin tiştan bi vê qertê bikirin.
- Ji bo li super market an jî li dikkanan tiştan bikirin, ji bo bikaranîna qertê bê bêş e.
- Ji bo pere-dirav ji banqa yê ATM'ê kişandinê bac'ek ne-hatiye diyarkirin, lê mimkûne ji bo danûstandin a bi banqa yê re bêş ek biçûk ji we were girtin. Ji bo bêş-bac a qertê , wê saziya ku qertan li we belav dike wê bi berferehî we agahdar bike .
- Ev qert tenê li Yûnanîstanê bi kar tê. Gava ku ev qert li derveyî Yûnan bê bi karanîn wê qert were qefilkirin.
- Ev qert ji bo pere kişandinê ne û ne hesabê babqayê ye. Û hun nikanin pera bikin vî hesabî.
- Hun hemî perê di qertêda xerc bikin jî, qertê navêjin, hil-din ji bo danûstandinek din.
- Eger we di nava heyvê da perê ku di qerta we da ne, we xerc nekirin, ew perê mayîn, tê da dimînin û hun kanin hey-va din wan peran jê bikşînin.
- Dema ku we qert û KOD a qerta xwe we girt, wa li ciyekî ewle veşêrin.

# 8/ Ez kanim qerta xwe biguhezînim ser yekî din?

Ev qerta li ser navê we hatiye derxistin û ev qert , nabe ku tu biguhezînî ser navê yekî din. Pêşiya ku perê heyvê bikevin qertê,saziyên ku alîkariya pere-dirav belav dikin, wê navê we û qerta we ,wê rastandin bikin. Li ciyê ku dimînin û eger qerta we bi were be, wê perê heyvê bikevin qerta we.

# 9/ Alîkariya pere-dirav wê çiqas berdewam bike?

Ji bo dem a bernameya pere-dirav belavkirinê ,wê saziya ku qertan belav dike,wê we ji bo dem a bernameyê agahdar bike. Berdewamkirina bernamê ,girêdayî saziyên cûde yên ku pere-dirav didin e. Tarîxa borî a qertê , têkiliya xwe bidawîkirina bernameya alîkariya pere-dirav tuneye.Tarîxa li ser qertê têkiliya xwe bi dem a qertê heye,lê ne bi dema bernameya alîkariya pere-dirav . Alîkariya pere-dirav ne mûçe ye, lê alîkarî ke mirovî ji bo penaberan e , ji bo ku kanibin hewcetiyê xwe , ji bo dem ek qut bi cîh bînin.

# 10/ Gava ku ez qerta xwe wenda bikim/ KOD'ê qerta xwe ji bîr bikim wê çi bibe?

Ji kerema xwe re bi saziya li ciyê ku hun dimînin û li we pere belav dike re bikevin têkiliyê.

# 11/ Ji bo pirsên di derheqê bernameya alîkariya pere-dirav û di derheqê qerta we da :

Hun kanin , bi rêya ofîsa agahdariyê an jî bi rêya xeta telefonê bi saziya ku alîkariya pere-dirav ku li ciyê ku li we pera belav dike re bikevin têkiliyê. Dema ku qertan bidin we , wê we ji bo ofîsa agahiyê û xeta telefonê agahdar bikin.

## Ciyê ku xwarin tên pêşkêşkirin

Tabloya jêr rêjeya alîkarîya pera li beramber xwarinê nîşan dide:

| HEJMARA ENDAMÊN MALBATA | MEBLEXA ALÎKARÎYA MALÎ |
|---|---|
| Şexsî li ser 18 salî | 90 Euro |
| Cotik, yan yek dê û bav û zarok | 140 Euro |
| Malbateke sê kesê | 190 Euro |
| Malbateke ji çar kesî | 240 Euro |
| Malbateke ji pênc kesî | 290 Euro |
| Malbateke ji şeş kesî | 310 Euro |
| Malbateke heft kesî keyan jî zêdetir | 330 Euro |

## Cîyê ku xwarin naye dayîn

Tabloya jêr rêjeya alîkarîya pera ji bo cîyê ku xwarin naye dayîn nîşan dide:

| HEJMARA ENDAMÊN MALBATA | MEBLEXA ALÎKARÎYA MALÎ |
|---|---|
| Şexsî li ser 18 salî | 150 Euro |
| Cotik, yan yek dê û bav û zarok | 280 Euro |
| Malbateke sê kesê | 340 Euro |
| Malbateke ji çar kesî | 400 Euro |
| Malbateke ji pênc kesî | 450 Euro |
| Malbateke ji şeş kesî | 500 Euro |
| Malbateke heft kesî keyan jî zêdetir | 550 Euro |